

## Geleşeya Binavkirinê

### Wêjeya Dijkolonyal û Postkolonyal

**dr. Dilawer Zeraq**

Wêjeya kurdî ya li bakur,<sup>1</sup> ji alîyekî ve jî bi bandorên tirkî û bi beralîkirinên Stenbolê, berê xwe daye têgih û awayên binavkirinê yên Rojavaya ku nîşan bi têgih û binavkirinên Ewropa û Emerîkaya Yekbûyî dike. Vê berêxwedanê, ji gelek alîyan ve bi kêrî wêjeya kurdî jî hatiye.

Kurdî, ew ziman e ku li bakur pê berhemên wêjeyî yên kurdî tên nivîsîn, paşxane û kulîyatek pê ava dibe û dîsa, kurdî ew ziman e ku sed sal in, ji bo feyde û mêzgirîya li ser zimanê tirkî, bi gelek awayên pêkanînên mêtîngerîyê ve, dûçarî qedexekirineke kafîrkanî hatiye û pê re jî hatiye cewêlkkirin (subordinate) û axêverên vî zimanî jî, di gelek warên jîyanî de, hê jî bi asîmîlasyonê dîlkafir re rû bi rû ne.

Wêjeya kurdî ya li bakur, di van helûmercan de, tê dixebite teqlan bide xwe û xwe bigihîne asta Wêjeya Dinyayê.<sup>2</sup>

Di vê têxebitînê de, gava dor tê ser binavkirina hin teşe, form û şêweyên nivîsîn û berhemên wêjeyî, ji ber sedema esasî ku ji ber ‘bandora têgihîkirina tirkî û bi beralîkirinên Stenbolê’ ye, geleşe û geremolîyêke binavkirinê derdikeve rastê.

Mêtîngerî, ji alî dîrokîbûna xwe ve, yek ji awayê pêkanînên kevntir yên mirovan e; bi binavkirinên wekî ‘mêtîngehîya kevnereng’ û ‘mêtîngehîya rengmodern’ dibe du beş û ev du beş jî bi awayên ‘mêtîngerîya dereke’ û ‘mêtîngerîya navxweyî’ ji hev dibin du şax. (Zeraq, 2022; 21-23) Mêtîngerî, li her derê û di her demê de, li ser bingeha ‘desthilat-çewisandin-zordestî’ya hêzekê ya li ser hêzeke din, daye der û hemû sîstemên xwe jî li ser ‘mêtîna zengînîyên ‘gel-neteweyekê’ ya bi desthilata zordar û bi çewisandinê’ saz kiriye. Ji ber hindê jî, mêtîngerî geleşeyêke pîrhêlî û pîrrehend e. Digel hêlên dîtir, hêlên wê yên axî-erdî, aborî (ekonomî), sîyasî, zanavî (identity), neteweyî, zimanî û çandî bêtir derdikevin pêş û her yek di hindama xwe de teknîk, epîstemolojî, hewan (scope), rege-raman û awayên pêkanînên xwe hene. Loma jî, mêtîngerî; bi hemû hêl û rehêdên xwe ve, geleşe û pêkanîneke pîr arizî xwe ye û bi tevî encamên xwe ve jî, rengûawayekî xwe yê der-mirovî heye.

Berî niha sed salan, Kurdistan, bi awayekî ku her beşek jê wekî mêtîngehên ‘hundirîn-navxweyî’ be, di nav çar netewe-dewletan de hatiye çarparkirin û lihevdaşkirin. Wekî dongîya vê çarparkirinê, her beş û parçe di hundirê xwe de, li gorî sîstemên mêtîna û pêkanînên mêtîngerîyê bûye xweyî helûmercên taybet.

Herçî ziman û wêjeya bi zimanê kurdî ye, li ser rewş û helûmercên her beşê û parçeyê, kême zêde bi heman awayî dirûv girtiye. Ji ber ku di vê nivîsarê de, mijara me tenê wêjeya bi kurdî ya li Bakurê Kurdistanê ye, em ê ji bergeh û riwangeya mêtîngehîyê ve, bala xwe bidin ser binavkirina wêjeya li bakur tê kirin.

Her wekî me di serî de jî bal bir serê, gelek caran, ji bo wêjeya kurdî ya li bakur, geleşeya binavkirinê ya der barê binavkirinê de çêdibe. Û gelek caran jî, kes hema wisa ‘jîdevhilana(d)î’ û ‘jîberxwe’, nav li hin awayên berhemên wêjeyî dikin. Lê belê, her çend têgihên wêjeyên Ewropa û Emerîkayê li dinyayê cî li xwe xweş kiribin jî, her yek têgihê, digel qonaxên dîrokê û lêqewmîn û ezmûnan reng û teşe daye xwe û li ser şêwe, naverok, şêwaz,

bandora qewimînan û qonaxa dîrokê û li ser rewşa civak-neteweyê hatiye binavkirin û bilêvkirin.

Têgihên ‘wêjeya dijkolonyal’ û ‘wêjeya postkolonyal’ jî wek wisa ne û li ser dem, qonax, lêqewmîn, derava têdeyî, ezmûn û li ser gelek kartêkan tên bilêvkirin û binavkirin ku em ê di vê nivîsê de bala xwe bibin ser vê gelemşeya binavkirinê.

Ji bo têgihîştineke baş, em ê serê pêşîn biçin cem Achille Mmembe ku dibêje, “Têgiha postkolonyalizmê, bi taybetî, rêgeheke dîyar ya dîrokî; yanî wan civakan pênase dike ku di van demên dawîyê de, piştî ezmûnên mêtîngerîyê û piştî şideta ku ji ber têkilîyên mêtîngerî û mêtîngehîyê qewimîye, derketine rastê.” (Mmembe, 2021:132) Ji vê pênase û ravekirinê em têdigihîjin; postkolonyalizm ‘*piştî ezmûnên mêtîngerîyê*’ dikeve behsê û ji hêla pêdeçûna demê û pêkanînen mêtîngerîyê ve, birastêketineke paşdemî ye. Her wisa, şeweyê nivîsîna bi rengekî postkolonyal jî, rastî serdemê ve paşdemî tê û berhemên ku di vê ‘dema paşdemî’ de tînin nivîsîn, dibin xweyî wê taybetîyê ku dikarin di nav rexnegirîya wêjeya postkolonyal de bihewin û loma jî “Rexne(girî)ya postkolonyal, ew şeweyê nivîsînê yê aktîvist e ku hay jê heye; helûmercên borîrojê bi gelemperî ji helûmercên îroyîn cudatir in, lê bi tevî wê jî, *di dem û dîrokê de* bi paş ve vedigere û li ser tevgerên dijkolonyal hûrgerîyê dike û bestê ji wan hiltîne.” (Young, 2016: 14)

Di ravekirina Robert J. Young de, rengûawayê rexnegirîya postkolonyal, di gotinên ‘*bi paş ve vedigere û li ser tevgerên dijkolonyal hûrgerîyê dike û bestê ji wan hiltîne*’ de pir xweşikî aşkere dibe û em bi zelalî tê digihîjin û pê digihîjin dongîyekê. Li ser vê têgihîştin û dongîyê, dîsa bi zelalî û teqezî, em dikarin bêjin; wêjeya ‘dijkolonyal yanî dijmêtînger’ helwest û hewldanek e ku di dem û qonaxa aktîf ya pêkanînen mêtîngerîyê de dide der û ji bo ‘rexnekirin-libersekînin-aşkerekirina’ pêkanînen mêtîngerîyê, bi taybetî jî ‘bi zimanê ‘binelî (hîmî)’, yanî bi zimanê gelê-neteweya mêtîngehê’, tînin nivîsîn. Û ji ber ku wêjeya dijkolonyal, wêjeyeke vegotîna li ser wê qonaxê ye û ji ber ku ew qonax bi gelemperî li ser berxwedana li dijî mêtîngerîyê ye; di vê dem û qonaxê de, li ser kîjan xetê be bila bibe, ramana vê berxwedanê li ser ‘rizgarîya neteweyî’ ye û bi tu awayî nikare di ser ‘îdeolojîyan’ re were binavkirin û bilêvkirin. Dîsa, ji ber ku mêtîngerîya rengmodern, li ser ramangerî û îdeolojîya ‘kapîtalîst-empyralîst-dagirkirin’ê li dar e û ev her sê li ser ‘îdeolojîyêke taybet ya pevexistî’ tînin pêkanîn, hemû rabûn û vegotinên dijmêtînger jî, xweyî ‘helwesta ramanî û îdeolojîyêke arizî xwe ne.’

Digel vê yekê, rexnegirîya wêjeya postkolonyal; piştî ‘dekolonîzasyon’ê, yanî piştî dema bidestxistina serbixwetîyêke sîyasî-ekonomîk û destnîşankirina sînorê statuyêke rengdewletî, ‘*vegerîna bi paş ve ye*’ û di vê vegera xwe de ‘*li ser tevgerên dijkolonyal*’ hûrgerîyê dike.

Gava em bala xwe didinê, em dikarin bêjin; rexnegirîya postkolonyal, di hewana û çarçoveya xwe ya berfireh de, xebat û lêkolînê li ser wêjeyeke dijkolonyal dike. Lê belê, di vê

têgihîştin û têgihîkirinê de, xaleke girîng heye û divê bê zelalkirin; her çend rexnegirîya postkolonyal, bi gelek alî û taybetiyên xwe ve, bi rexnegirîya dijkolonyal ve bestandî be jî, wêjeya dijkolonyal û wêjeya postkolonyal, ji hêla dem û qonaxên nivîsîna berhemana ve ji hev cihê dibin.

Wêjeya dijkolonyal; ew reng-wêje ye ku hem di qonaxa aktîf ya mêtîngerîyê de hem jî piştî bidawîbûna qonaxa aktîf ya mêtîngerîyê û bi taybetî bi zimanê 'binelî', yanî bi zimanê mirovên mêtîngehê û yê marastîyan (kolonîzekirîyan) tê nivîsin.

Wêjeya postkolonyal, -postkolonyala ku "wateya wê ya îdeolojîk nediyar û xumamî ye" (Mollaer, 2012: r.p: 5)-; ew reng-wêje ye ku piştî 'dekolonîzasyonê', yanî piştî bidestxistina serbixwetîya statuyeke reng-dewletî, rabûnên tevgerên dijkolonyal û pêkanînen mêtîngerîyê yên di dem û qonaxa mêtîngerîya aktîf de li xwe dike mijar; û pê re jî, wekî dongîya asîmîlasyona zimanî, an bi zimanê 'binelî'yan an jî bi zimanê mêtîngeran tê nivîsîn.

Li ser van agahîyan, gava em bala xwe didin ser wêjeya kurdî ya li bakur, em bi zelalî û teqezî dikarin bi nav bikin û bêjin; beşek ji berhemên wêjeya kurdî ya li bakur, digel helûmercên axî-terîtoryayî, sîyasî, ekonomîk, zimanî û çandî, bi naverok û vegotinên xwe yên li ser hişmendîya 'xwebûn'ê û li ser zimanê xwe yê 'binelî-hîmî' tînin nivîsîn û ew berhemên ku **di vegotinên xwe de, bi helwesteke danandî û tercihkirî û bi awayekî hişmendane,**<sup>3</sup> pêkanînen mêtîngerîyê li çîrok û romanên xwe dikin mijar an jî di vegotinên xwe de nîşan bi wan pêkanînan dikin, xweyî wê rengûawayê ne ku em dikarin wan wekî 'wêjeya dijmêtînger-dijkolonyal' bi nav bikin.

## Çavkanî

Mollaer Fırat (2021) *Anti-Kolonyalizm Söylemi*, Bursa: Dora Basım Yayın

Mmembe Achille (2021) *Postkoloni Üzerine*, Ankara: Hece Yayınları

Young J., Robert (2016) *Postkolonyalizm-Tarihsel Bir Giriş*, (çev.Burcu Toksabay Köprülü-Sertaç Şen) İstanbul: MatbU Kitap

Zeraq Dilawer (2022) *Rengê Hebûnê*, Diyarbekir: Weşanên Lîs

<sup>1</sup> Di vê nivîsê de, mebest ji kurdî, kurmançîya li bakur e.

<sup>2</sup> Têgiha Wêjeya Dinyayê, ji pênasekirina J. du Bellay heta bi ya J. W. Goethe û di ser wan re jî heta bi pênasekirina P. Casanova, amaje bi wê wêjeyê dike ku Ewropa û pê re jî Emerîkaya Yekbûyî wekî navend qebûl dike û wêjeya ku bi zimanê îngilîzî û fransî (û ji hêlekê ve jî bi elmanî û spanyolî) jî wekî hîm û esas tînin danîn.

<sup>3</sup> Gelek berhem û vegotin hene ku behsa pêkanînen mêtîngerîyê dikin. Lê belê di wan berhemana de, pîrî caran nivîskar pêkanînen mêtîngerîyê wekî 'motîfêke pêreyî û tewawker' ya vegotina xwe ya esasî behs dikin û tu hişmendî û terciha vegotinê ji wan berhemana nadin der. Loma jî, vegotin û berhemên wêjeyî yên wisa, her çend behs jê bikin jî, ji ber ku 'ne bi helwesteke danandî û tercihkirî hatine nivîsîn', nakevin nav çarçoveya 'vegotina dijmêtînger.'

*Nîşe: Bi tevî hemû agahî û daneyan, rewşeke dîtir heye li bakur; beşek ji nivîskarên bakur hene, di qonaxa mêtîngerîyê de, bi zimanê mêtîngeran dinivîsin, lê belê bi awayekî hişmend û tercîhkirî pêkanînên mêtîngerîyê li çîrok, roman û vegotina xwe dikin mijara hîmî; ew berhem hem ji alî mijar û vegotinên xwe ve hem jî ji ber tercîhkirina bi hişmendî, dikevin çarçoveya 'wêjeya dijkolonyal.' Digel vê yekê jî, ji ber rewşa zimanî ku di xwemalîyê (aîdiyetê) de dîyarker e, divê hûrgerî û gengeşeyeke taybet, kûr û berfireh li ser van berheman bê kirin.*